

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (156) Sal 28 20 Avrêl 2023 z - 2635 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# Agirê NEWROZê venamire !



Pakrewanên Newroza Cindirêsê- Efrîn 20 Avdar 2023 an
“Mihemed Osman” “Mihemed Fereh Eldîn Osman” “Fereh Edîn Osman” “Nezmî Osman”

Cindirêsa wêranbûyî

## Desteya sernivîser

Li gor kevnedîroka netewa Kurd, bi saya xebata Kawa yê hesinker desthilata Ezdehakê sitemkar hatiye rûxandin, gelê Kurd û hemû gelên deverê ji zordestî û çavsoriya wî rizgar bûne; û bi hatina destpêka Buharê re, rojeke nû li wan hilatiye, agirê Newrozê tariya jiyana wan ronî kiriye.

Ji wê rojê ve, û da ku di dîrokê de careke din efsaneya Newrozê dubare nebe, neyarên hebûna gelê Kurd û dagirkerên welatê wî, bi hemû hêza xwe, şerê agirê Newrozê kirine û hê jî dikin, dixwazin vemrînin û bidin jibîrkirin!.

Tê bîra me çawa dezgehên ewlehiya rijêma Sûriyê, di şevên Newrozan de, li deverên Kurdî belav dibûn, dadana .....

2

## Tawana Cindêrisê dîwarê tirsê hilweşand!





### Newroz

Berêvara roja 20-ê Avdarê, şeva Cejna Netewî ya Kurd NEWROZ, li bajarokê Cindêrisê, çekdarên «Ceyş El-Şerqiye», bi hovîtiyeke kesnedî, 4 kes ji malbatekê kuştin. .....

4

## 27ê Avdarê «Roja Cîhanî ya Şanoyê»



Bi bûneya hatina «Roja Cîhanî Ya Şanoyê», li Qamişlo, bi beşdariya birek rewşenbîr, nivîskar û hezkirên Şanoyê, Koma Şano ahengek lidar xist. Di wê ahengê de, hunermendê Şanoyê birêz Enwer Mihemed hate xelatkirin, û gotina «Roja Cîhanî Ya Şanoyê» ku hatibû wergerandin bo zimanê Kurdî, ji bal birêz Newafê Bişar ve hate xwendin.

Hêjayî gotinê ye ku her sal, gotina .....

7

# Çima Mirina bi saxî heye?!

**Nazdar Hesen**

Pir caran, dema mirov di rewşên dijwar û kambax re derbas dibe, an dema li pey hev derd, bela û bobelatên giran li ser serê wî dicivin û tûşî cûreyên êş, zor û zordariyê dibe, Cîhan li ber çavên wî reş dibe, jiyana wî tev tarî dibe, deriyên hêviyê li ba wî tên girtin û digihêje baweriya ku, ewê qet ji van rewşan sax û saxlem dernekeve! Mixabin ev jî rastiyek e, dibe ku mirov ji xişim û belayên hatine serê wî bi laş û canekî sax derkeve, lê bêgûman bandûra tiştên tê re derbas bûyî wê gelek bin, û ji ber ku tu carî tiştên şikestî wek xwe berê nazivirin, û qet birînên kûr cihên wan winda nabin, ewê tevlî berdewamiya jiyanê bimînin, nîşan û rojê hezar carî wan bibîrê bînin. Belê rewşên dijwar û rojên reş dihêlin mirov bibe mirovekî dî, mirovekî lawaz û ji hundir ve rûxandî, an mirovekî dilmirî giringiya tu tiştî li ba wî nîn e, ev herdu jî ji cûreyên mirineke bi saxî ne!



-Çima mirina bi xweşî heye?!

-Erê heye, dema welatê mirov di bin nîrê dagirkeran de binale, û ew nikaribe tiştekî jê re bike, bi saxî ew mirî ye!

-Dema mirov ji cih û warên xwe bi zorê bê derxistin, bi saxî ew mirî ye!

-Dema mirov di dewelata xwe de bibe koçber û hestên biyaniyê giyanên wî bipêçin û bê zar û ziman bimîne, bi saxî ew mirî ye!

-Dema mirov destê xwe ji ax, mal, deşt, çiya û zozanên welatê xwe, û ji dayîk, bav, xwîşk, bira, dost û hevalên xwe berde û ber bi welatekî biyan ve biçe, ew ne tenê bi saxî mirî ye, lê ew mirin bi xwe ye!

Ji ber vê yekê jî em dikarin bibêjin ne tenê dema laş û canê mirovekî spartî axê dikin ew ji miriyan têne hejmartin, lê pir û pir kes hene tevî ew dijîn, di gola êş û xeman de mirî ne!

**Agirê... Dûmahîk**

êgir qedexe dikirin, li Cizîrê, Kobaniyê û Çiyayê Kurmênc hemwelatî digirtin, zindan û îşkince dikirin. Li sala 1986-an, Silêman Adê, û sala 2008-an jî li Qamişlo, 3 xortên Kurd ên bêguneh kuştin!.

Herweha diho, dema ku dewleta Turkiyê û çekdarên cîhadîst ên Sûrî yên pêve girêdayî, Efrîn dagir kirin. Berî her tiştî, bi armanca vemirandina agirê Newrozê, ew bezîne peykerê Kawa yê hesinker û ew rûxandin, ji cihê wî hilkirin û bi lingên xwe yên gemar pêlê kirin!

Li Cindêrisê jî, bi heman armancê, hêzên tariyê, bi pilana dewleta dagirker, şeva Newroza vê salê, çeteyên pêxwas ên bermayên rêxistina Da'işê 4 Kurdên bêsûc kuştin û reviyan!. Lê, gelê me li Efrînê serî hilda, li dij dagirkerên bê rewişt û bê'ol, xwepêşandanên mezin lidar xistin, bi yekîtiya xwe, tirs xistin hinavê neyaran. Herweha, li derveyî welêt û Ewropa, bi sedan xwepêşandanên protestkirinê lidar ketin, derd û kulên Kurdên di bin tariya dagirkeriyê de dijîn û tawanên wê yên kirêt aşkere kirin!

Bila neyarên gelê Kurd baş zanibin ku kuştin, girtin û îşkencekirina xebatkarên gelê Kurd doza wî çareser nakin, ne jî çavên wî bo xebata wî ya rewa dişikînin. Çendî ew hewl bidin agirê Newroza wî vemrînin, zimanê wî qedexe bikin, şer û cengan li dijî hebûna wî bikin jî, lê tucarî ew nikarin wî agirî vemrînin û baweriya wî bi azadiyê û jiyaneke serbest sist û qels bikin!.

Rast e ku dema îro gelê me di rewşeke xirab û ne xweş de dijî, eve rastiyeke li ber çavan e, Efrîn, Girê Sipî û Serê kaniyê ji bal dewleta Turkiyê ve hatine dagirkirin, û gelê me li wan deveran di dojehê de dijî. Bi armanca guhertina demografî li deverên dagirkirî, li ber çavên dewletên mezin ên cîhanê, xwediyên hêz û biryarê, her roj û her gav, tawanên hovane dij gelê me têne kirin bêyî ku ew bi erkên xwe rabin!. Lê, em pê bawer in ku ev rewş dirêj nake, bi saya xebata dilsoz û xemxurên vî gelî, bi saya kerwanên qurbaniyên keç û lawên wî, tarîperest û dagirker dê ji welêt bêne avêtin, birînên dil dê qeşmûşk bigrin, û gelê me dê azadiya xwe bidestxîne. Tu hêz li ser rûçikê cîhanê nikare agirê Newroza wî vemrîne û vîna wî bişkîne!

Pakrewanên Newrozê, pakrewanên xebata aştî, azadî û wekheviyê namirin!.

Newroz li gelê Kurd, li berxwedêrên deverên Kurdî yên dagirkirî, û hemû aştîxwazên cîhanê pîroz be!

# Çima û ji çi re evqas şer û ceng?!

**Melek Murad**

Gelek pirs xwe di serê mirov de hildidin, ma gelo kî nizane ku goga me ya zemînê çiqas fereh û mezin û zengîn e. Bêgûman ew têra tevan dike, ew hemû cureyên miletan bê cudahî dipejirîne. Çiqas mixabin, ku mirov nikarin li ser wê hevdû bipejirînin !!... Tim û herdem ew çand û kultura çavsorî, rikiberî, ezezî, çi li vir û çi li wir, belav dikin!

Wisan jî, energiyeke neyênî di hundir mirov de cîh digire, bi taybet di hevdema me ya îro de, jî wê cihekî ne hindik girtiye, û akamên xwe yên têvel li hawîrdoran diweşîne. Loman merov carinan dibîne ku, şer û cengên giran li deverekê bêtir, li navbera du rikberan lidarxistine, û di encamê de bi hezaran mirov bûne qurban.

Weke mînak: Di şerê cîhanê yê yekemîn de, bi qaserî -30- milyon kes bûne qurban ji bilî kesên seqet, digel kavil û wêrankirina avahiyan serûber! Piş tre, dewletên mezin û xwedî hêz dirûşmên aşîtiyê hildane û wan pêwîst dîtine ku şer raweste, aştî û hêmenî li seranserî cîhanê pêk were. Zor mixabin, wê heyama aştî û agirbestan pir dirêj nedikir.

Piştî -21- salan careke dî berê cîhanê çawa dîsan didine şerekî giran, şerê cîhanê yê dudiyê pêdikeve. Wisan jî, li encamê di wî şerî de -75- milyon kes dibine qurban! Careke din ew dewletên mezin mîna Emrîka, Rûsiya, Berîtanya û Firansa lêborînê ji hevdû dixwazin û aşîtiyê pêkitînin. Herweha şêweyeke nûh bi holê dikeve (rêjîma cîhanî ya hevdemî), lê çiqas pir mixabin ku ew heyama aştî û lihevkirinê, wê jî dîsan, wek dixuye pir dirêj nedikir û cî nedigirt. Disan jî goga me ya zemînê weke li van rojan ji tevan ve baş bêlî dibe ku, hêmenî û hepîvan ji cihekî pirtir û nemaze li rojhilata navîn, û li ev çend salên dawî rûdawên şer û cengan hewiş vedane û berdewam in.

Rikberî di navbera dewletan de zêde û gur dibe. Rêjîma cîhanî ya nuh li tehlûkê dikeve, şerê Ukraine jî wê dixe ber dolabê. Lewre jî, pir dewlet bûne deverên terorê, kavil û wêran bûne, wek nimûne: Afganistan, Lîbiya, Yemen, Êraq, Sûriyê û li vê dawiyê Ukraine jî hilma wê dighe her derê!!

Pirsa girîng û bingehîn ew e ku, ma gelo sedemên evqas şer û dijîtiyan li dijî van nakokberan çine? Li gora bîr û baweriya me be: Sedema herî sereke ew e ku, siyasetmedar û sergermên cîhanê, dema ku berjewendiyên xwe dane û didin pêş her tuştî, wê di ser rêzigrtin, wekihevî, rûmeta mirovan, hêmenî, aştî û azadiyê re digirin, wan bê şerm û fedî didine û dane ser şopa berjewendiyên




xwe! Bi vî awayî, hin milet pişaftine û hin dî jî, bindest, xizan û bêçare hêştine.

Li raberî vê yekê pir dewletên dîktetor, faşî û nijadperest li dever û welatên cîhanê, bi taybetî li Rojhilata Navîn serî rakirine, ew carinan li hêla Nato xwe dibînin û carinan jî xwe bi ser Rusiyan ve dijmêrin, û carin dî jî berve Çînê dipekin! Li encamê, ew mafên mirovan tenê weke dirûşm li gora berjewendiyên xwe hildidin. Mixabin bi vî rengî wan rûmet û hestên xwe yên mirovatî winda kirine û pêl yasayên navnetewî kirine! Loman jî, goga zemînê wek ji tevan ve baş xuya ye diheje û diçelqe, bi ser evqas derd û pirsgirêkên curbecur de jî, li 6 ê sibata 2023-yan li ber destê sibehê, Erdhejeke mezin û bêhempa li herêm û bajarên Turkiyê wek: Meraşê, Hetayê, Amed, Entab û h.w.d û yên Sûriyê jî li pir dever û bajaran wek herêma Efrîna birîndar û dagirkirî, li pir gund û bajarokên wê wek: Cidirêsê, Reco, Şiyê Xalita û ta Heleb, Latiqyê h.w.d, ji wan deverên jorîn ziyana herî balkêş û mezin li bajarokê Cindirêsê bû.

Ew pir bi jan û êş bû, li encamê bi hezaran avahî hilweşîn û bi sedan jî, xelkê jiyana xwe ji dest dan, û hîn jî goga zemînê tebat nedîtiye, pir erdhej û rengvedanên wê li rê ne! Ligel ku Sûriya me ya şêrîn, vaye -12- sal in bûye devera teror, bivetî û nakokiyên mezin tê de serî hildane, û nemaze li herêma Efrînê ya dagîrkirî ji hêla rêjîma Turkiyê digel çeteyên wê yên Opozisiyona Sûriyê ya islamî - radîkal ve, wan bi her reng û awî zor û setemên xwe bi serê mirov, zevî, çem, kanî û daristanan pêkanîne û hêjî tê de berdewa min!

Erê xwendevanê gotara me, ma tu çi dibêjî? Erdhej û rengvedanan, bandaf û lehiyên ku li piştî evqas şer û cengan were çine? Rikberî û zikreşiya bi me Kurdan re têye berdewamkirin, herêmên me talan û dagîr dibin çiye? Kî û çi dikare ji van zikreşî, rikberî û çavsoriyan bipejirîne û çima erdhej wê çênebine? Ma gelo, ev goga zemînê ya nazdar dikare ji vê yekê re bêje erê? Dawiya evqas şer û ceng, zor, stamkarî, dizî û talankirinê ji erdhejiyê bêtir wê çi be?!

# Tawana Cindêrisê dîwarê tirsê hilweşand!

**Newroz**

Berêvara roja 20-ê Avdarê, şeva Cejna Netewî ya Kurd NEWROZ, di wê dema ku malbata Osman li bajarokê Cindêrisê, li ser banê xwe, agirê Newrozê pêxistibûn û li dora wî civiyabûn û şahî dikirin, çekdarên «Ceyş El-Şerqiye», ya ku piraniya endamên wê ji rêxistina Daiş in, û anha ew girêdayî Artêşa Niştimanî ya Sûrî ye, bi hovîtiyeke kesnedî, bi xwîneke sar û kîneke reş ew civata xortan gulebaran kirin! Di encamê de, 4 kes ji malbatekê hatin kuştin, ew jî ev bûn:

Nezmî Mihemed Osman (53) sal - Ferehedîn Mihemed Osman (45) sal - Mihemed Ferehedîn Osman (19) sal - Mihemed Mihemed Osman (38) sal, û hinên din jî birîndar bûn, paşê yekî ji birîndaran jî jiyana xwe ji dest da!

Navên hin ji Kujeran hatine naskirin:

Umer Salih Elesmer (23) sal - Hebîb Elî Xelef (19) sal - Bîlal Elebbûd (23) sal, bi piştgiriya Elî Xelef (Ebû Hebîb Xişam) ku ji gundewarê Dêra Zorê ne.

Li roja 21-ê Avdarê, bi beşdariya hezaran kes ji Cindêris, Efrîn û gundên derdorê, bi coşeke mezin, bi saloxanên Azadî ji Efrîn re, darizandina kujeran, derketina hemû çekdaran ji devera Çiyayê Kurmênc û bi hildana Ala Kurdî netewî, pakrewan hatin veşartin.



Debarê vê tawana pilankirî, dewleta Turkiyê û dûvikên wê, xwestin rastiyê biguhêrin, wan got ku ji ber derketina pevçûnê di navbera wan û kesine sivîl de derketiye, ev bûyer çêbûye, û qaşo ewê wan ceza bikin. Lê, rastî nayê veşartin, û kujer ji desthilatdariya deverê ne, bi nav naskirî ne!

Xelkên Efrîna birîndar, di vê bûyera dilêş de, bi yek dengî qêriyan, dengên xwe li dij zor û sitema çekdaran bilind kirin, û li pêş mala qurbaniyan serhildaneke mezin lidar xistin, bi mêraniyeke mezin û dilekî xemgîn derd û xemên xwe yên 5 salan ji dagirkeriya malwêran, ji raya giştî re aşkere kirin; tirs û saw xistin dilê çeteyan û dewleta dagirker.

Li Ewropa, Herêma Kurdistanê, Bakur û Rojhlatê Sûriyê, û gelek deverên dunyayê, xwepêşandan lidar ketin û ev tawana hovane ya dijî gelê Kurd û Newroza wî şermezar kirin.

Eve ne cara pêşîn e ku cejna Newroz, cejna aştî, azadî û wekheviyê, bi xwîn û êş di ser gelê me yê Kurd li Sûriyê re derbas dibe, emê hin bûyerên xwîndar bibîr bînin:

- roja 21-ê Avdara sala 1986-an, bi guleyên rijêma Sûriyê li Şama paytext, Silêman Adê (Pakrewanê Newrozê yê pêşîn) jiyana xwe ji dest da, û li bajarê Qamişlo hate veşartin.

- 20-ê Avdara sala 2008-an, li ser destên hêzên ewlehiya dewletê li Qamişlo, 3 xortên Kurdan, di dema dadana agirê Newrozê de, hatin gulebarkirin û can spartin, û beyaniya Newrozê ew li goristana Hilêliyê bi beşdariya hezaran kes hatin veşartin.

- 21-ê Avdara 2010-an, hêzên ewlehiya rijêma Sûriyê li Reqayê, xelkên sivîl, yên ku bi Newroza xwe şad dibûn, dîlan dikirin û stranên Folklorî digotin, gulebaran kirin, hin kes hatin kuştin û birîndarkirin.

Derbarê vê tawana mezin, Rêxistina Human Rights Watch, bi sernava «Tawana Cindêrisê jî tevlî tawanên 5 salan dibe», daxuyaniyek weşand, û weha got:

«Kuştina Kurdan di şeva Newrozê de li Cindêrisê bi destê çekdarên girêdayî Turkiyê, tawaneke dîtir e ku tevlî zincîra tawan û zêdegaviyanên mezin ên derheqa nişteciyên devera Efrînê li dirêjahiya 5 salan dibe.

Şeva Newrozê 20-ê Avdarê, çekdarên «Ehrar Elşerqiye» yên girêdayî artêşa niştimanî ku bi Turkiyê ve girêdayî ne, di dema ku malbateke Kurd li Cindêrisê agirê Newrozê pêxistibûn û cejna xwe pîroz dikirin, ew gulebaran kirin, 4 kes hatin kuştin û hine din jî birîndar ketin!»

Cîgirê Kargêrê beşê rojhilata navîn û bakurê Afrîqayê ya Human Right Watch birêz Adem Kûgil got:

«Ev kiryarên kuştina mirovan piştî 5 salan ji talankirin û zêdegaviyên mafên mirov li ser destê hêzên Turkiyê û çekdarên pêve girêdayî têne kirin, bê ku dewleta Turkiyê li hember van zêdegaviyan raweste.»

Herweha rêxistin pêve çû û got:

«Ji ber ku Turkiya hêza dagirker e û li wê devera bakurê Sûriyê ew ji çekdarên xwecihî re piştgir û alîkar e, ew pabend e ku lêkolînê di vê kuştinê de bike û kujeran ceza bike. Herweha ji Turkiyê tê xwestin ku ew hemû rengên alîkariyê ji ser çekdarên Artêşa Niştimanî Sûrî yên ku gelek caran pêl mafên mirov kirine bibirin û li gora Yasaya Navdewletî ew bêne darizandin».

Bila cihê pakrewanên Newroza Cindêrisê bihuşt be, serê malbatên wan û gelê Kurd sax be!

# Careke din qedera reş xwe li me Kurdan dimîn e

**Zelîxan Cimo**



Li Berbanga Roja Duşemê 6. 2. 2023anZ, erdhejeke zor dijwar li Turkiyê û Sûriyê rûda û bi taybetî jî herêmên Kurdî li herdu welatan, qedera reş dîsa xwe li gelê me mand û xezebeke zor dijwar bi ser de anî, xemgînî û şîniyê konê xwe di ser me re vegirtin. Yek ji wan herêmên me yên ziyan dîtine Efrîn, û taybet jî Bajaroka Cindirêsê bû. Di encamê de, bi sedan avahî bi ser xwediyan de hatin hilweşandin - ji bilî sedan avahiyên herfandî ku li ber hilweşandinê ne - û bi sedan jin û mêr, kal û pîr û ciwan û zarokên di hembêza diyan, û bavan de, di bin kavilan de man û jiyana xwe ji dest dan; bi sedan jî birîndar û seqet bûn, û bi hezaran jî bê cî û war li kolanan li ber serma û barana zivistanê man!

Lê tiştê tewrî bi›êş, di rojên pêşîn de nalenal û fîxana xelkê me di bin kavilan de dihat, lê tu alî di hawara wan de derneketin, û ji ber wê jî hejmara qurbaniyan zêde bû. Derd û kulên xelkê me yên Efrînê ji roja dagîrkirina wê li 18. 3. 2018an Z. ve û ta erdheja şeşê Reşmehê dikşên û hîn jî berdewam in, cimkî nandozên li wir destlatdar, bi serpereştiya Istîxbaratên Turkiyê, dev ji kiryarên xwe yên qirêj di dermafê gel û axa me de bernedan û bernadin, herwekî ew piştî erdhejê bi nijadperestî bi xelkê me re didin û distînin, û cudahiyeke beloq dixin nav wan û anîndeyên biyan, çi di derxistina xelkê ji bin kavilan an kolandina gorên qurbaniyan, û an jî belavkirina alîkariyên mirovî de (yên ji aliyê komele û dezgehan ve dihatin pêşkêşkirin). Ne tenê weha jî, ew bi her awî hewil didin ku xelkê Cindirêsê bi aliyê koçberiyê û çadirgehan ve têvedin, û ji malên wan bi dûr bixînin, da ku di pişt re jî heyînên di hin malên wan mane de û yên di bin kavilan de jî bidizin, û bi alîkariya dewletên herêmê yên piştgir ji wan re piroseya guhertina demografî ya nijadperest li herêma Efrînê bi giştî û li Cindirêsê bi taybetî bimeşînin.

Lê xelkê me yê Kurd ji wê pilanê re hişyar in, ew li ber xwe didin û rijd in ku ji malên xwe bi dûr nekevin, û çadirên xwe li nêzîk malên xwe yên wêranbûyî vedin û tê de jiyana xwe derbas bikin, ta ku malên xwe ji nû ve ava dikin. Vêca li hember vê vîn û berevaniyê, ji gelê me yê Kurd bi tevayî û bi taybetî jî Rêvebiriya Xweser û Hikometa Herêma Kurdistanê tê xwestin ku, bi her awî ji gelê xwe yên hundir Efrînê re piştgir û palpişt bin, da ku ew kanibin di berevaniya xwe de berdewam bin, û ew pilana qirêj jî nere serî!

## Pîrozbahî



Bi hatina Ceina Netewî ya Kurdî NEWROZ, Birêz Bafil Celal Talebanî/ Serokî Yekîtî Niştimanî Kurdistan birûskeke pîrozbahiyê ji Partiya me re şandiye. Li jêr em deqa wê bi Kurdî ya Soranî digel bersiva wê diweşînin:

Birêz: Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Be boney hatnewey serî salî nûyê Kurdî û cejnî Newrozewe, germtirîn û ciwantirîn pîrozbayîtan araste dekeyn, hîwadexwazîn lem bûne netewîye gelî Kurdman le rojawayî Kurdistan bigat be mafe rewakanî xoy û le Sûryaş demokrasî û aştî û seqamgîrî û dadperwerî bête arawe, diyalog û guftûgo bibête bijardey yekem bo kutayîhênan be qeyran û nehametiyekan.

Dûbare, cejnî Newroztan pîrozbêt û her şad bin.

**Dilsoztan**
**Bafil Celal Talebanî**
**Serokî Yekîtî Niştimanî Kurdistan**

**Bona Birêz Serokê Yekîtî**

## Supasî û Pîrozbahî



**Niştimanî Kurdistan…**
**Heval Bafil Celal Talebanî…**
**Silav û rêz…**

Bi serfirazî, pîrozbahiya cenabî we ji partiya me re gihaye me û bi dilgermî em cenabî we û heval û hogirên Yekîtî Niştimanî Kurdistan, herweha hemû partî û xelkê herêmî Kurdistan û Îraq bi boneya Cejnî Newroz pîroz dikin, hêvîdar in ku, nirx û wateyên agirî cejnî Newroz, her dê zindî û dê bibe rêbaz û navnîşanî herî giranbuha û sereke bona mafên mirov û taybetmendiya gelan, bona Aştî, Azadî û Wekheviyê.

Careke dî Newroza we û gelê Kurdistan pîroz be.

***Şad û bextewer bin***

**Dilsoz**
**Muhyedîn Şêx Alî**
**Sekreterê Partiya Yekîtî Ya demokrat a Kurd Li Sûriyê**
***Qamişlo-Sûriya 20.03.2023-an***

# Alîkarî û kutana hesin bi hêsin!

**Zanistê cûmê**

Ev cara yekê ye, ku xişim û bêtarên bi vî rengî bi serê çiyayê Kurmênc de, bi destê çeteyên hovane yên radîkal bi piştgir û alîkariya artêşa dewleta Turkiyê hatine, û hîn jî berdewame. Bajarê Efrînê tev gundewarên wê di 18.03.2018 an de hat dagîrkirin. Zordarî û binpêkirinên bi hemî awa û rengan bi serê gelê Kurd ji hêla (artêşa niştimanî sûrî) ve tê kirin, û ne wek ji hêla hevalbendên (artêşa azad) ên Kurd tê gotin ku karine tekane ne. Çi kuştin, lêdan, girtin û ta dar qutkirin bi destê hemî giropên çekdar in û bi erêkirina dewleta Turkiyê tê kirin û hîn jî berdewame.

Zerzela di 06.02.2023 an de li bajarokê Cindirêsê xistî, aşkere û baştir xuya kir, ku ev giropên çekdar û destlata turkiyê çiqas tundrew û cudatî dikirin navbera Kurd û Ereban, bi ser de jî, Turkiyê wek



dewletek dagîrker bi erk û sutbarên xwe ranedibû. Bilî ku derî li pêş encûmen, dewlet û komeleyên xêrxwaziyê û alîgiriyê bi rûniştvanên resen yên li Cindirêsê bikin, bi rastî gelê Efrînê bi xort û keçan, kal û pîran bi hewcedarî alîkariyê ne, vêca çi alîkariyek moralî be yan jî diravî be.

Bi rastî piştî derbasbûna dezgeha xêrxwaziya Berzaniyê nemir û alîkirina wan bi kesên ziyan ji zerzelê dîtine, li ba kurdaxiyan tiştekî mezin bû, û hestê netewî û morala wan bilntir kirin. Bandora wê yekê di komkujiya cencewîdên Turkan di dermafê çar Kurdan de ji mala pêşmerge xuya û zelal bû. Lê mixwabin ka em ji xwe û bilî xwe bipirsin.

Çima dewleta dagîrker ya Turkiyê û hukmeta demkî ya sûrî rê dan dezgeha Berzanî, berî ku rê bidin welat û dezgehên biyanî yên cîhanê û ta alîkariya rêveberiya xweser ya ku di roja yekê de li ser sînor amede bûn ku bişînin, lê rê nedan wan?

Bawer im Turkiyê xwast hesin bi hêsin bikute, û ew perçebûn û nelihevkirina di navbera tevgera Kurdî û çi jî kurdistanî de xurt û zêdetir bibe, ta kanibe rêvebiriya xweser ya ku bi hezarn pakrewan di ber Kurd û sûriyek dadmend, aştixwaz de dane, ku rûreş bike, û alîgirên xwe encûmena Kurdî xwedî rolek erînî di nav Kurdan de xuya bike. Lê ev yeka han ji aliyên ku rola Kurdan û Efrînê dişopîne nayê veşartin û ne jî tê jibîrkirin. Şoreşa şêx Seʿîd û kêrên leşkerên Turkan di sîng û zikê jinên me yên bi canan re kirine hîn ji bîr nebûne.!

Bi rastî ger Turkiyê û alîgirên wê ve berketiyê Efrîniyan û Kurdan bûna, di roja reş de /72 /balefir li ezmanê Efrîna dagîrker ranedikirin, bi hovîtî gundewarên wê bombe nedikir, û ne jî ev gilgemara li seranserî sûriyê li Efrîna rengîn û bedew kom nedikir! Netê wetayê, ku em li dijî hatina dezgeha Berzanî ne, ji berêpaşê de me gotiye: (du Kurd li ku bin, li hev bikin em pîroz dikin, û ger derfet hebe em yê sisyê ne). Divê em baş zanibin bi tucarî Turkiyê û ne jî dûvçilên wê karekî erînî ji bo doza gelê Kurd û Kurdistanê bikin. Berî her tiştî divê em xwe nas bikin, piştî nasînê, divê em dijminê xwe jî nasbikin!




# 10 sal derbas bûn, hê jî Pakrewanê raman û pênûsê «Kemal Henan» bi me re dijî!



Berî 10 salan, li roja 31. 01. 2013-an, bi guleya tivinga kîndarekî şoven, dilê mezin, dilê mişt evîn û mirovatî, dilê nivîskar, rewşenbîr û siyasetmedarê Kurd ê dilsoz Kemal Henan rawestiya.

Ev 10 sal di ser wê tawana reş re derbas dibin, hê jî Kemal Henan bi raman, pend û germahiya dilê xwe bi me re dijî û her dê bi gelê xwe re bijî, tu carî ew jibîr nabe.

Digel ku destên gemarî ên tarîperestan, neyarên mirovatiyê hingivtine gora wî û peykerê Kawayê hesinker li Tilif û Efrîna birîndar, lê baweriya me bi gelê me û xebata wî heye ku nêzîk dê rojek were, gora wî nû bibe û peykerekî nû ji Kawa re çêbibe, hêzên tariyê li ber bayê serhildanê herin!

Di 10-mîn salvegera şehîdbûna Kemal Henan de, Newroz û xwendevanên wê li ser soza xwe ne, bê dudilî ewê rêya wî bişopînin û armancên wî pêkbînin!

Cihê wî bihuşt be, neman û şermezarî ji teror û kujeran re!

Serê malbatê û gelê me sax be!

**27ê Avdarê... Dûmahîk**

«Roja Cîhanî Ya Şano» tê wergerandin bo zimanê Kurdî, û di malpera fermî ya Komîta Navdewletî ya Şanoyê de tê weşandin.

Li jêr, deqa gotina «Roja Cîhanî Ya Şanoyê» ye:

**Nameya «Roja Cîhanî ya Şanoyê»,**
**Ya sala 2023-an**
**Semîhe Eyûb-Misir**

***Werger ji zimanê Erebî: Newafê Bişar***

**Hevalên min ên şanoger li seranserî cîhanê…**

Di bîranîna «Roja Cîhanî ya Şanoyê» de, ez vê gotinê bi we re parve dikim, diweşînim. Ji hêlekê ve, ji ber ku bi we hevalan re diaxivim, ez bi keyfeke mezin hest dibim. Ji hêleke din ve, ji ber sedemên rikberî, şer û pevçûnên giran ku li cîhanê belav bûne, xişm û bobelatên xwezayê ku li cîhana me ya îro rûdane, bendora xwe li rewan û jiyana me -weke şanoger û ne şanoger- ya aborî û derûnî jî kirine, aramî, aştî û xweşiya jiyanê ji me dûr ktine, ji ber vê hindê, ez gelekî dilsar û xemgîn im!

Îro ez bi we re diaxivim, hesteke wiha li min peyda bûye herwekî cîhana me bi tevayî bûye mîna giravên cihê-cihê û dorpêçkirî, yan jî mîna gemiyên bazdayî ku ew di asoyên mij û moranê de winda dibin, ku her yek ji wan bê armanc û pilan li ber pêlên deryayê diçe. Di asoyê de, ew tu nîşanan nabîne ku li gora wan riya xwe ya rast bibîne, lê digel wê jî, bi hêviya ku bigihe cihekî aram, ew di nava pêlên deryayê yên tengijî, di nava windabûneke dirêj de, her birêve diçe!



Tucarî, cîhana me ji hev nêzîk û bi hev re têkildar mîna îro nebûye, di heman demê de jî, tucarî ew mîna îro ji hev dûr nebûye! Di vî warî de, gelek tişt ji me ve aşkere û zelal dibin. Digel ku em tev hûrguliyên nûçeyên cîhanê dibînin û dibihîzin çimku alavên ragihandinê yên nûjen, sînorên cografî di navbera dewletan de şikandine, derbas kirine, lê di heman de jî, rikberî û pevçûn bi piranî li cihanê geş bûne, ji ber wan jî, cîhana me ji bingehên mirovatiyê dûr ketiye!

Şano, di naveroka xwe de, karekî mirovî ye, li ser bingeha rastî ya mirovan rûdine, ango, naveroka wê jiyan e! Li gora gotina pêşengê mezin Qustentîn Stanslaviskî dibêje:

«Dema ku lingên te bi herrî be, derbasî şanoyê mebe! Toz û gemarê li derve bihêle. Tekez bike ku tu metirsiyên xwe yê piçûk, berberî û zehmetiyên xwe yên sivik bi cil û kincên xwe yên derveyî re bihêlî. Her tiştа ku jiyana te kavil bike, hiş û bala te dûrî hunerê bike, wî li cem derî bihêle û derbas bibe!».

Dema em derdikevin ser sehneya şanoyê, di hundirê me de jiyanek bi tenê, ya mirovekî bi tenê heye, lê, ew jiyan dikare bizê û pir bibe, gelek jiyanên din jê bipişkivin, gul vedin, da ku em hemû bi hev re, bi bîna wan a xweş mest bibin.

Karê ku em weke nivîskar, derhêner, akter, sînograf, helbestvan, mûzîkjen û dîzayner dikin, tenê ew ji bo afrandina jiyaneke nû ye ku berî em derkevin ser sehneya şanoyê, ew jiyan tune bû. Ev jiyan hêja ye ku destekî dilovan wê biparêze, sîngeke germ wê hembêz bike û dilekî mezinî mihrevan guhdanê lê bike, mercên man û jiyanê jê re peyda bike.

Bawer im ku ez ji rastiyê dûr nakevim dema bêjim ew karê ku em li ser sehneya şanoyê dikin, ew karê jiyanê bi xwe ye û afrandina wê ji tunebûnaê ye. Ew kar dibe mîna pizoteke agir ya ku di tariya şevan de, ronahiyê belav dike, tîn û germahiya wê, sir û seqema şevan dişkîne.!

Em li kêleka wî kesî ne yê ku jiyanê xweş dike û em bi xwe jî wî karî dikin, û da ku jiyan bi wate be, em xebatê dikin û sedemên têgihiştina wê jî pêşkêş dikin.

Em in yên ji bo rakirina tariya nezanî û tundûtûjiyê, ronahiya hunerê bikar tînin. Em in yên rêbaza jiyanê di dilên xwe de hiltînin û hawîr wê belav dikin û ji bo pêkanîna armancên pîroz em dema xwe, xwîn, xwêdan û rondikên çavên xwe dikine qurban. Herwewha, ji ber em bawer in ku ev jiyan hêja ye bê jiyankirin, em berevaniyê di ber nirxên wekhevî, dadmendî, xêr û spehîtiyê de dikin.

Îro, ne tenê ji bo pîrozkirina ahenga şanoya ku bi navê Bavê Huneran tê binavkirin û pîrozkirina roja wê ya cîhanî ez bi we re diaxivim, lê belê ez ji we dixwazim ku hûn hemû bibin yekdest, mil li mil, li ser sehneyên şanoyan, da ku wijdanê cîhanê hişyar bibe, dengên xwe bilind bikin. Bila ew li naveroka mirovan ya windayî bigerin! ew mirovê azad, dilevîn û nermîn, ewê ku nerîna dîtir dipejirîne, û hûn nema wan wêneyên hovîtî, nijadperest, rikberiyên xwîndar, tundûtûjî û sîstema yekraman bibînin.

Hêj berî hezarên salan ve, li ser pişta vê gerdûnê û di bin vî asmanî de mirov birêve çûye û her dê biçe, ji we tê xwestin ku hûn lingên wî ji çamora şer û rikberiyên xwîndar derxînin, bila ew wan li ber dergehên şanoyê bihêle, bi hêviya ku mirovatiya me ya goman li ser heye, careke din li me vegere, û bi serfirazî em karibin bêjin: Em hemû mirov in, em birayên hev ên mirovatiyê ne! Ew name û erkên me şanogeran e, hilgirên xetîra ronahiyê ji wê dema ku akterê pêşîn derkete ser sehneya şanoya pêşîn ve ye. ji me tê xwestin ku berî her kesî li hemberî karên nemirovane, her kiryarên gemar û kirêt serî hildin, bi her tiştê xweşik, zelal û mirovane rû bi rû bibin, berî her kesî em, em bi tenê dikarin jiyanê biafirînin û nûjen bikin, em hemû bi hev re, ji bo yek cîhanê, yek mirovatiyê xebata xwe bişopînin.

# Ferhengnasî (lexicology) û Ferhengdanîn (Lexicography)

Dilovanê Deştê

Ziman, di pêvajoya xwe de seranserî dîrokê, di du qonaxên sereke re derbas bûye: devkî û nivîskî. Peyv, li gor vê pêvajoyê, di rêya axaftinê re, hem dihatine naskirin û têgihiştin, hem jî di nav civakê de, nifş bi nifş, dihatine veguhestin. Ev jî bû sedemeke sereke û bingehîn ku bi dehan ziman, di vê qonaxê de, têkçûn, windabûn û ji holê rabûn. Lê, piştî pêşketina ramanweriyê, şêweyên parastina zimanan jî bi giştî pêşketin. Vê qonaxê jî bi destpêka nivîsandinê re dest pê kir, nemaze şêweyê komkirin û ravekirina peyvan, û belgekirina wan di rêya nivîsandinê re; û bi derbasbûna qonaxên demê re, vê şêwenivîs û belgekirinê di pirtûkan de cih girt, û bi navê FERHENG hatine naskirin.

Dema em bêjeya ferheng dibêjin, du têrmên zanistî yên nuh xwe didin pêş, ew jî Ferhengnasî (lexicology) û Ferhengsazî (Lexicography). Ev herdu têgeh jî du şaxên zanistî ji zimanzanînê ne. Berî em li ser van têghan rawestin û wan şirove bikin, pêwîst e em bêjeya (ferheng) nas bikin û zanibin ew çi di nav rûpelên xwe de vedihewînê.

Ferheng, şêweyekî pirtûkê ye taybet e ku, li ser bêjesaziyê radiwestê; ew bêjeyan baş rave dikê û wateyên wan zelal dikê. Hêjayî gotinê ye ku, gelek cureyên ferhengan hene; ew jî li gor rêzkirina peyvan, peyvên pîşesazî di beşekî zanistî yan civakî de, ... hwd. Piştî vê kurtepênaseyê ji têgeha ferheng re, gelo çawa ferheng saz dibê? Ji bo bersivdana vê pirsê, pêdivî bi ravekirina du têgehên din heye, ew jî ferhengnasî (lexicology) û ferhengnivîsîn/ferhengsazî (lexicography) ne. Weku ji van terman tê zanîn, herdu jî girêdayî binyatdanîn û avakirina ferhengê ne, ji ber ku ew wateya bêjesazî û peyvnasiyê (etymology) dişopênin.

Ferhengnasî ji peyva Yewnanî ya kevin lexicology hatiye wergirtin. Lexicology bi xwe peyveke hevedudanî ye ku ji (lexico = bêje) + (logos = zanîn) ava dibê. Ango, ew li kok, wate, cure, bilêvkirin, daraştin û şêweyê girêdana peyan bi hev ve ji bo derbirîneke rast û dirust, vedikolê. Lê, ev tev dimênê karekî teyorî, û bikaranîna wê ji erkê kesê ferhengsaz/ferhengnivîs e.

Têgeha duyemîn ferhengnivîsîn/ferhengvanî ye. Ev têgeh wateya bêjeya Yewnaniya kevin (lexicography) e. Lexicography ya Yewnanî ji du peyvan saz dibê. Lexico = bêje, peyv, û graph = nivîsîn; ango bêjenivîsîn, bêjedanîn. Herweku ji wateya wê xuya ye, ew karê danehev û nivîsandina peyvan destnîşan dikê. Ev kar jî li gor du hêmanên bingehîn tê bikaranîn. Yek ji wan berhevkirina komek peyv û biwêj, û ya didiwê jî rêzkirina wan peyvan li gor hin bend û rêbazan, ji bo hêsankirina daraştina bêje, rist û hevokên hevedudanî ji yên sade û asan. Ferhengsaz, di dawiyê de, encamên vê rengexebatê di pirtûkekê de kom dikê û belav dikê.

Digel ku pir cureyên ferhengan hene ku li gor mijarê, yan jî li gor rêzkirina peyvan li pey hev, ferhengvan gelek tiştên têkildarî her bêjeyekê, li pey wê bi xwe zelal dikê. Ew bilêvkirina bêjeyê, kok, wate, cureyê rêzimanî (navdêr, rengdêr, lêker, ... ), dem û raweya her lêkereke ku derbas dibê, girêdana bêjeyê di hevokan de bi yên din ve, ... hwd, rave dikê. Em dikarin karê wî di van gavan de bi kurtasî bêjin:

1- Komkirina peyvan.
2- Daneheva zanyariyên rasteqîn li ser her peyvekê.
3- Bijartina şêweyê rêzkirina peyvan di ferhengê de.
4- Bijartina pergalekê ji bo rêzkirina peyvan.
5- Nivîsandina peyvan li gor pergala bijartî di hindurê pirtûkekê de (ferheng).
6- Belavkirina encamên vê xebatê.

Di dawiyê de, ka em vê pirsê ji xwe bikin: Gelo, ferhengên zimanê Kurdî yên berdest li vê gorê hatine amadekirin û weşandin? Yan jî, zanistiya zimên li warekî razihayî ye, û em di meydana kêmzanînê de û bi hişmendiyeke çandî ye kor û teng, dixebitin?

# 5-emîn Slavegera Nivîskar û Xebatkarê Kurd Mihemed Zekî (Diljar Seyda)



Roja Yekşembê 16.04.2023, bi bûneya 5-emîn salvegera nivîskar û xebatkarê Kurd ê dilsoz Mihemed Zekî (Diljar Seyda), Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî digel birek rewşenbîr, malbat, zimanhez û hevalên partiyê serdana gora wî kirin û bi rêzdarî ew bibîr anîn.

Diljar Seyda, yek ji wan nivîskaran bû ku bêdeng, ji bo zimanê Kurdî û pirsa Kurdî xebateke kûr birêve dibir, herweha ew yek ji damezrênerên Saziyê bû, endamê Komela Ciwanên Kurd û Desteya xwecihî ya Newrozê û endamê Kovara Welat bû. Bi dehan gotar di weşanên Kurdî de belav kirine û ji bo pîşvebirina ziman û çanda Kurdî cefa dîtiye.

Cihê wî bihuşt be, serê malbat, dost, heval û hezkiriyên wî xweş be!

# NIVÎSEKE BALKÊŞ LI SER KURDAN



Hesen Cemalê Rojnamevanê Tirk, nivîsekê li ser pirsa Kurd weşandiye û cewr û zaltiya Dewletê ku li Kurdan kiriye xal bi xal nivîsiye.

Hunermendê Kurd Dilbirînê Deşta Mûsê Ebdirehim Îlker jî ew nivîs li rûpela xwe ya Facebokê weşandiye.

Îşev dema min ew nivîs xwend, min jî wergerand Kurdî.

**Rojnamevanê hêja Hesen Cemal gotiye:** Em hewqas Kurdan diperçiqînin û zimanê wan qedexe dikin, gundên wan dişewitînin jî, lê di vê Erdhejê de berî her kesî Kurd hatin alîkariya me.

Min jî du roj berê ev nivîsa bi tîpên gir weşandibû:

DI ALÎKARIYA ERDHEJÊ DE LI SERANSERÊ DINYAYÊ BAŞÛRÊ KURDISTANÊ YEKEMÎN WELAT BÛ KU BERÎ HER KESÎ XWE GEHANDIYE CIHÊ HERÊMA ERDHEJÊ. EV JI BO KURDISTANA FEDERAL ŞANAZIYEKE MEZIN E.

***Spas Kurdistan.***

Fermo de em nivîsa Hesen Cemalî bixwînin:

***Zeynelabidîn Zinar***

”ME JI WAN RE GOT NA NA!...
LÊ ME DÎT KU BERÎ HER KESÎ EW HATIN ALÎKARIYA ME!...

Me got, “Kurd nîn in, Tirk hene.
Me got Kurdî tune, Tirkî heye.
Me got Kurdistan tune, Tirkiye heye.
Kesên ku digotin ez Kurd im, me ew xistin girtîgehê,
Ji ber ku bi tirkî nizane, bi Kurdî diaxive.
Me sîle li xwendekarê dibistana seretayî dixist.
Me Kurdî li cihên giştî qedexe kir.
Gundî li sûka bajêr bi Kurdî diaxivin,
me ew birin qereqola cendirmeyan û me dest danî ser berhemên wan.

Bi gotineke din:
Me zimanê wan ê zikmakî qedexe kir.
Me guh neda çanda wan, heta me ew şermezar kir.
Me gotina “ez Kurd im”ê sûc dît.
Me peyva “Kurdistan”ê wek cezayê girtîgehê dît.
Me gotina “Kurdistan”ê wek “xiyanet” nirxand.
Me ji bo Kurdan “hemwelatiya wekhev”îtiyê pir dît.
Me navê cihên ku Kurd lê ji dayik bûne weke gund, bajarok, guhertin.
Me navên bi Kurdî, wergerandine tirkî.
Me malên Kurdan şewitandin.
Gund û mezrayên wan ji aliyê dewletê ve hatin şewitandin
Me bi girseyî êşa koçberiyê bi Kurdan da kişandin.
Me dewletê derxist derveyê hiqûqê.
Me “kuştinên kiryarnediyar” li wan kir.
Me zulmxaneyên mîna Girtîgeha Leşkerî ya Amedê, avakir.
Me li wan deran forsa xwe nîşanda.
Me destûr neda ku Kurd bi kurdbûna xwe azad bijîn.
Me destûr neda ku Kurd bi nasnameya xwe siyaset bikin.
Wan partiyek ava kir, me ew girt.
Wan partî ava kirin û me girtin.
Kurd wek parlamenter hatin hilbijartin, me ew xistin girtîgehê.
Ji bo şaredariyan hatin hilbijartin, me ew xistin girtîgehê.
Weke “1938 Dêrsim” me ew bi hezaran di şikeftan de bi gazê jherê kuştin.
Pirsgirêka Kurd bi vî awayî afirî.
Bi vî awayî “rêya çiya” hat vekirin.
Di navbera pirsgirêka Kurd û çek û tundiyê de bi xwîn û hêstiran hate barkirin. Bi vî awayî girêdana hovane çêbû.
PKK bi vî awayî derket holê.
Ciwanên Kurd bi vî rengî ketin rêya çiyê.
Me got “Pirsgirêka Kurd nîne, pirsgirêka terorê heye.”
Em ji peyva Kurd ditirsiyan.
Em ditirsiyan ku em behsa “pirsgirêka kurd” bikin.

Em difikirîn ku ger em wisa bikin, dê pirsgirêka Kurd ji holê rabe.
Dema me ew yek dikir, me digot qey dê rêya çiyê were girtin.
Me digot qey wê PKK biqede.
Çu hêviyên me pêk nehatin.
Pirsgirêk nehatin çareserkirin û kûrtir bû.
Tirkiye ji aliyê madî û manewî ve bi salan xwîn rijand,
demokrasî û serweriya hiqûqê
mehkûmê sinifa duyemîn, sinifa sêyemîn, pêşveçûn û mezinbûna aborî
astengkirina barê refahê pêşîlêgirtina bilindbûna wê…
Bi gotineke din, li vî welatî
pirsgirêka Kurd ku «dayika pirsgirêkan e»
Sal derbas bûn û me nikarîbû vê yekê bihesibanda.
Ji êşan hêsir û xwîn dirijîne.
Me tu ders dernexist.
Hêjî wisan e…
Hêjî girtina partiyên wan berdewam dikin.
Girtîgeh ji siyasetmedarên Kurd, ji şaredar û
ji parlamenteran tije ne.
Niha bi 6 milyonên dengan
Ji bo girtina HDPê,
Em amadekariya “qedexeya siyasetê” dikin.
Ev rêbaz pirsgirêkê çareser nake.
Pirsgirêk gav bi gav kûr dibe.
Aştî û aramî xewnek e.
Ma em hîç ders wernagirin...?
Heyf û xebînet!»
HASAN CEMAL / T24


***SPAS Hesen Cemal***
14.02.2023

# Agirê Newrozê!

***Dema ku Xebatkarê Kurd ê navdar, parêzer Mehmûd Şewket Ne›esan, ê ku yek ji damezrênerên yekemîn Partiya Kurdî li Sûriyê sala 1961-ê, digel hevalên xwe yên partiyê, di zindana Mezê de bûn, dibihîze ku Gelê Kurd li devera Çiyayê Kurmênc bi firehî agirê NEWROZê li ser Çiyan pêxistiye, cejna xwe ya netewî pîroz kiriye, dilê wî şad dibe, bi coş û evîneke mezin wê pêngavê dinirxîne, û di zindanê de helbestekê bi navê «Agirê Newrozê» dihûne.***

***Helbesta wî ya nirxdar di kovara ÇIYA hejmar-8 de, ya ku li ser destê birêz Hemreş Reşo li Ewropa derdiket, bi navê nehênî Ebû Rahêb, hatiye weşandin.***

***Ji ber ku îsal NEWROZa Çiyayê Kurmênc bi destên dagirker û çeteyan bi xwîn derbas bû, em deqa wê helbestê diweşînin:***



## Agirê Newrozê!

*Mehmûd Şewket Ne›san*

Dibêjin
Li çîyê, mêr û jin,
Bi sedan hatin Girtin.
Bi dehan ve gund,
Vala bûne warê kund.
Li Reco, Heleb û Efrîn,
Mexfer û zîndan,
Dagirtîne.
Sêpî û kehreb,
Li dar kirîne
Êşandin û lêdan,
Bûne heyf û kîn,
Kal û ciwan,
Dikin qêrîn,
Dikin nalîn,
Bi lez û hêrsî,
Min dipirsî:
Gelo, çi bûye?
Çîye ev mizgîn,
Nimayîşek rabûye,
An hevalan,
Gerandine kom û civîn?
Gotin:
Na…Na…mestire…
mestir,
Çîya hmû bûne agir,
Di Şeva Newrozê,
Taliya zivistan û
bahozê,
Li serê her çiyakî,
Zinar û qefakê,
Bi destên gel û hevalan,
Mêr, jin û kalan,
Bi zîrekî,
Bi çalakî,
Bi hezaran,
Agir pêketin,
Erd û ezman bûne yek,
Bi nav hev ketin,
Zaro, keç û pîrek, Ecêb
mayî, raneketin,
Digotin:
Siba bihuşt e,
Stêr daketin,
Li Meydan, Keferdelê û
Basil,
Li Reco, Gaz û Bilbil,
Gerandin,
Govend û dîlan,
Bi dahol û zirne,
Lîlî û stran,
Keç û xortan tev,
Dest dane hev,
Reqisîn,
Bi dil û dev,
Şabûn û kenîn,
Di roja newroz a ciwan,
Pêk anîn girêdan,
Dawet û mihrecan.
*****
Li mebahîs û terî,
Bi roj û şevên tarî,
Na sekinin,
Ranawestin,
Mîna segên har û gurî,
Dîn bûne,
Şaş bûne,
Çep û rast dibezin!
Li serên xwe dixin,
Xwe digezin,
Bi meş,
Mîna dizên keleş,
Bi siwarî,
Bi rêzên xwar û berwarî,
Bi gerokan,
Bê den,
Bi çirayên temirî,
Her gav,
Erîşan,
Dibin gundan,
Deriyan dişkînin,
Dikevin malan,
Ji nav nivînan,
Mêr û jinan,
Keç û xortan,
Bê sinçî,
Mîna hovan,
Radikşînin,
Lingan kil dikin,
Destan di paş da
grêdidin,
Bi kotek û lêdan,
Li çend mexferan,
Digerînin,
Mîna esîran,
Gulbe bi gulbe,
Bi Helebê ve dişînin,
Bê hiş û hay,
Xelkê digrin,
Lê…. nizanin,
Çi bikin?
Dibînin:
Agir hîn pêketîne,
Tîrêjên sor,
Çarmedor,
Ber bi jor,
Hilkişîne,
Serekên wan,
Bi qîr û halan,
Li sîngîn xwe dixin,
Lingan li erdê didin,
Pêş û paş,
Tên û derin,
Bi bihîstokan,
Bi birûskeyan,
Emre didin,
Dibêjin:
Zûbin!!
Li her der bela bin,
Agiran bimrînin,
Bi carekê,
Ronahiyê hilînin,
Ev agir,
Agirê gur û pir,
Nîşan in ... nîşan
Nîşanên Şehrezadî,
Û azadiya kurdan!
Serbestî û mêraniya
wan,
Tînin bîra wan,
Ji lewra divê,
Vê Şevê,
Yên ko êzing civendine,
Yên ko agir pêxistîne,
Yên ko lê nirîne an
dîtine,
Ango bi yek gotin,
Xelkên çiyê,
Hemî bêne girtin!
Min dîsa gote wan:
Bi xurtî,
Bi zimanekî giran:
Gelî hevalan ...!
Raste…. ew ji agir
ditirsin?!
Ji ber ko dinasin,
Eve agirê Hurmiz,
Pê şewtîne,
Ehremen û xiniz,
Li ber roniya wî,
Aşkere dibin çete û diz,
Raste, ew ji agir ditirsin,
Ji ber ko dinasin,
Ev agirê Newrozê ye,
Ronak û pîroz e,
Bo serbestiyê,
Felat û azadiyê,
Peyman û soz e!
****
*Zindana Mezzê 04.1961*

# Erdheja Kehreman Mereşê... Bobelata herî bi êş û jan!

Newroz

Berbanga roja Duşembê 6-ê Subata 2023-yan, di wê dema ku xelkên Rojavayê Turkiyê û bakurê Sûriyê di xewa şêrîn de bûn, erdhejeke malwêran bi pileya 7.8 li gora pîvana Rixterê, li Turkiyê û Sûriyê, bi xurtî avahî hejandin, herifandin, bi dehên hezaran mirov di bin kavilan de mirin, bi hezaran mirovan jî, di bin kavilên avahiyên herifî de, bi girî, qêrîn û nale-nal, hawar û gazî dikirin da ku hin kes bi hawara wan ve herin, û berî mirinê wan ji bin kavilan derêxin. Lê sed mixabin ku gelekan ji wan kesan nema ronahî dîtin, û di bin wan kavilan de mirin û derfeta jiyanê bi dest wan neket!



Li gora amarên fermî yên Turkî û Sûriyê, bêtir ji 51000 mirovî jiyana xwe ji dest dane û 120 hezar mirov jî birîndar bûne, 11 bajar li Turkiyê taromar bûne û dora 214 hezar avahî ketine.

Li Cindêrisa xopan û birîndar, digel êşa giran a xelkên wê yên Kurd, tu alî bi hawara wan ve nehatin! Çeteyên girêdayî dewleta Turkiyê ya dagirker ku li deverê desthilatdar in, bi fermanên ji dewleta Turkiyê, xwe ji bihîstina nalîna birîndaran û hawara kesên jêr kavilan ker kirin û ji dîtina rewşa wan kor kirin, ta radeya di kolana tirban de, ji bo veşartina qurbaniyan, alîkarî bi wan re nehat kirin! Ne tenê wilo, wan çeteyan dest bi diziya mal û mewdanên wan kirin!

Dema Kurdan çadir xwestin da ku, nêzîkî malên xwe yên wêran, digel zaroyên xwe di bin wan de bihêwirin, bijîn, wan xwesteka Kurdan red kir û ji wan xwestin ku ew herin navend û kampên çêkirî cîwar bibin, da ku projeya guhertina dêmografiya deverê biserî bibe. Lê nişteciyên Cindirêsê armanca wan nas dikirin, lewre, wan kavilên xwe, cihên jidayikbûn û bîranînên xwe bernedan, digel dijwariya heyama sir û seqemê jî, ew li ser kavilên xwe, li derdora zeviyên xwe man û nehiştin ku plana wan a nemirovane here serî!

Cihê hemû qurbaniyên erdhejê bihuşt be, saxlemî ji birîndaran re, bi hêviya ku gelên cîhanê tu xişm û bêtarên dilêş mîna ya 6-Sibatê nebînin!

# Taybetên Zimanê Kurdî nasnama xwe ye

Mihemed Qere Hesen

Gava merv bêjeya nasname bilêv dike, tavilê nasnama kesîtî bi bîrê tê. Ango nav, navê dê û bavê, ciyê lê bûye, kînga bûye, rengê çavan û mirûzê wî digel tiştin dî têvel hebin.

Li gor vê pîvanê merv dikare netewa Kurd jî pê bipîve. Bi vî awayî, em dikarin van xal, merc û taybetên Kurdî şanî bidin û li ser rawestin.

1- Navê netewê: Kurd e

2- Kînga bûye û ji kîjan malbatê ye?

3- Li ku bûye?

4- Rewşên xwe yên zimên çine?

5- Ziman û xweyetiya netewî

Berî em derbasî gotara xwe bibin, divê têrma nasnamê were zanîn.

Nasname: Ewê ji bilî xwe ve bi rewş û tiştan cuda ye, ji hev tê naskirin û zanîn. Ango ew bi xwe ye.

Em li mijara xwe vegerin.

= Nav: Gelek nêrînên têvel, li ser têrma Kurdî li ba dîrokzanan hene. Hin ji wan vedigerînin peyva kerdox û netewek bi vî navî rojekê di dîrokê de li ser xaka Kurdistanê dijiya û bi wateya xedar hatibû naskirin.

Dîrokzanê almanî Cêrnot Fêlhêlm dibêje: Bêjeya Kurd ji ya Xurd hatiye, wateya xwe jî ronahî ye, bêjeya hor û xor ji hev in, û netew in di dîrokê de hebûn perestvanêne roya bi basik û ronahiyê bûn. Her wekî dî nêrîn di vê mijarê de pir bûn. Lê roja îro netewek ji komek mervan heye navê xwe Kurd e, û zimanekî xwe yeknetew heye. Lê hin ziman hene pir netew in. Ango pirtirî netewekê bi zimanekî dipeyvin. Îro zimanê Kurdî bi navê netewa xwe hatiye naskirin.

= Kînga bûye û ji kîjan malbatê ye?

Zaniyarên dîroka peyvkirina merv vedigerînin berî vê bi sed hezar sal (100,000). Bi gotinek dî, berî peyvkirinê hest, nest û raman li ba merev peyda bûn, li gor mercên heyama zemîngarî û gerekiyê û heyîna xwe ya civakî, guhartin di zenglorê de çêbû, deng ji serê serê lêvan ta dawiya gewriyê belav bûn, ew deng bûn tîp û bi hevketin, bêje hatin afirandin. Bêje jî li gor jiwariyê û vaca mêjî, ji hest, nest û ramanê û sazê xweş li guh hatine, bi hev ketin, stîla peyvkirina rêzmên hate afirandin (hevok hatin ristin). Wê peyvkirinê rûdawek civakî taybet wergirt û bû hêzek mezin di guhartina civakê de, û bi heve girêda û nimand. Ev yeka ha bû şoreşeke berdewam di heyîna merev de.

Di pêvajoya dîroka her girûpekê ji mervan de bi hev re jiyan û bûn netew, zimanekî xwe taybet wergirtin.


……/Dumahîk heye

# Serokê Komela Gelên di bin gefê de Têlman Zoltş Oxir be !

**Newroz**

Roja Înê. 17. 02. 2023-yan, dostê gelê Kurd û hemû gelên cîhanê, li Almanya, birêz Têlman Zoltş, piştî jiyaneke (83sal) tev kar û xebat di ber mafên hûrgelan û kêmnetawan, û hemû bindestan de, xatir ji vê gerdûna bê dad û bê aştî xwest, çav girtin û bar kir.

Li sala 1968-an, li bajarê Almanî Hamburgê, birêz Têlman Komela Navdewletî ya Gelên di bin Gefê de damezirand, paşê, wî cihê wê guheste bajarê Gutingun, û li Berlînê şaxeke wê vekir. Bi demê re, ji ber xebat û çalakiyên vê komelê geş bûn, şaxên wê li dewletine derveyî Almanya mîna Nemsa, Swêsra û Loksomburgê hatin vekirin, û di Yekîtiya




Ewropa û Yekîtiya Netewan (UN) de jî bû endamekî çavdêr.

Komela Gelên di bin Gefê de, bi serperiştiya Têlman, ji bo parastina maf û rûmeta Netewan xebateke bêwestan kiriye; ew bi xwe çûye li her çaar kinarên dunyayê geriyaye, li kêleka gelên bindest rawestiya ye. Hember sitema li ser gelê Kurd hatiye kirin jî, bêdeng nema ye; wî piştevaniya glê Kurd li Turkiyê, Îraq, Îran û Sûriyê bê dudilî kiriye.

Têlman Zoltş, dostê gelê Kurd namire, ew di dilê me de her zindî ye!

Hêjayî bibîrxistinê ye ku bi vê bûneyê, birêz Muhyedîn Şêx Alî, Sekreterê Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê, nameyeke sersaxiyê bi zimanê Erebî weşand, ev e li jêr, wergera wê bi zimanê Kurdî ye:

**Sersaxî**

**Encûmena Rêveberiya Komela Gelên di bin gefê de…**

**Berpirsê Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîqayê…**

Bi bûneya koçkirina dawî ya demezrênerê Komela Gelên di bin gefê de, dostê gelê Kurd birêz Têlman Zoltş, yê ku temenekî dirêj di berevaniyeke dilsoz, dij siyasetên şer û nijadperestiyê kiriye. Çûna wî, ji me hemiyan re ziyaneke mezin bû!

Bi rêya we, em sersaxiya malbata Têlman Zoltş, hemû karmendên komelê, dost, heval û hezkirên wî li Almanya û cîhanê bi tevayî dikin.

***Hûn xweş û aram bin.***

*Qamişlo 19.03.2023*

**Muhyedîn Şêx Alî**

**Sekreterê Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê.**

# Her sê kesên di wêneyê de xuya dikin û dikenin ji bal Turkiyê ve xwestî ne!



*** Cengîz Çandar** (1948) - Lêkolîner û rojnamevanê Turk ê navdar, xwediyê pirtûka «Tirêna Rafideyn a Xurt» e. Ji aliyê Partiya Kesk ve ew weke berbijêrê Parlementoya Turkiyê di lîsteya Partiya Gelên Demokrat (HDP) de hatiye pêşniyarkirin û HDP jî ew pejirandiye.

*** Can Dunder** (1961) - rojnamevanê Turk ê bi navûdeng e, sernivîserê berê yê rojnameya «Cumhûriyet»ê bû.

*** Xanim Emîne** Kakabawê, xebatkareke Kurd e, ji Kurdistana Îranê û endama perlemana Swêdê ye.

Emînê di rûpela xwe ya “Facebook”ê de dibêje: Dunder ji mezinên rojnemvanên Turkiyê ye, piştgiriya Erdoxan ji Da,iş re aşkere û riswa kir, û ji welatê xwe derbeder bû; Û Çandar mirovekî navnetewî rastgu û dostê Kurda ye; Herdu ji tirsonekiya siyasetmedarên swêdî re derbareyî danustandinên bi Erdoxan ê îslamî re dilxemgînin.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**